ŞERKEFTIN

www.tevgerakomunist.com | Hejmar: 11 | Dîrok: Çile 2024 | Biha: 1000 | DENGÊ ŞOREŞ Û AZADIYÊ

YEKÎTÎ Û BERXWEDAN SERKEFTİN E !

2 ROJEV: Ji bo Rojhilata Navîneke Azad Em Cepheya Gel a Antî Emperyalîst û Antî Mêtînger Ava Bikin

3 NEZERIYE: Li Bakur û Rojhilatê Sûrî Çîna Karkeran

4 JİN: Şoreşa Rojava ya Jin Ku Rojhilata Navîn Ronî Dike

6 HEVPEYVÎN: Em ê di sala 2024'an de berxwedan û rêxistinbûna xwe mezin bikin

Ji bo Rojhilata Navîneke Azad Em Cepheya Gel a Antî Emperyalîst û Antî Mêtînger Ava Bikin

Emperyalîzm asta kapîtalîzmê ya herî bilind e. Di serdema emperyalîzmê de hilberana sermiyanê kûrewî dibe. Sermiyan sînorên dewlet netewê derbas dike û bi şirîkeyên pir neteweyî ve dikeve meyldariya rêxistinbûnê. Asta yekdestbûna sermiyanê bilind dibe. Bi rêya îxraca sermiyanê (firotina der ve) şêweya mêtîngeriya malî pêş dikeve. Her ku wesfa teknîk û hêza kar bilind dibe, hilberan zerengiyeke hûtasa bi dest dixe. Gera rihet a sermiyanê, gîhaştina çavkaniyên daringan û bi rêya herî erzan gîhana daringan a serbajarên emperyalîst tê hedefgirtin. Serdestiya li ser çavkaniyên daringên binerd û sererd ku hilberana kapîtalîst pêwîstî pê dibîne xwedî girîngiyeke stratejîk in. Ji bo serdestbûna li ser ev bazara kapîtalîst reqabeteke mezin heye. Emperyalîzma kapîtalîst weke malî, siyasî û leşgerî xwe di dewleta emperyalîst de şênber dike. Ji ber ku kapîtalîzm – emperyalîzm tenê ne pêvajoyeke mutleq a avabûneke aborî û madî ye. Sermiyan ger ku xwe naspêre hêzeke spartiya zordariyê nikare hebûna xwe ava bike. Di heman demê de bi hebûna amûrekî ku di bazarê de wê biparêze û li ser dengeya firotin û kirînê de bixebite dikare hebûna xwe ava bike.

Di aliyê din de ev dengeya emperyalîst her tim ûsa berdewam nake. Sedsala 20emîn du caran şahîdiya du şerên cîhanî yên emperyalîst ku kir ku ev rastî bi awayekî herî tund derket holê. Şerê yekemîn ê emperyalîst ê cîhanî, di heyameke ku împaratoriyên Osmanî û Rûsyayê li dijî cîhana nû ya kapîtalîst têkçûn de hat jiyîn. Di serî de Îngilistan, Fransa, Îtalya û hêzên Rojavayî yên emperyalîst xwestin ku li Rojhilata Navîn qadên xwe yên serdestiyê berfireh bikin û çavkaniyên daring û niftê bixin bin kontrola xwe. Xwestin ku rêyên sewqê (şandin) yên sotemenî û daringên ku pêkhateya bingehîn ên hilberana kapîtalîst in di bin serdestiya wan de be. Ji ber vê şerê mezin dan ber çavê xwe. Dewletên nû hatin avakirin. Nexşeya Rojhilata Navîn ji nû ve hat xêzkirin. Împaratoriya Osmanî hilweşiya û li dewsa wê weke mîratgirê wê komara Tirkiyê hat avakirin û paradigmeya "Yek al, yek ol, yek ziman" hat xistin meriyetê. Di nav hevkariya emperyaliyetê de di rêya bûyîna dewleta kapîtalîst de meşiya.

Di heman heyamê de li dijî şerkirina ji bo berjewendiyên emperyalîst ên qeysertiya Rûsyayê, Partiyê Bolşevîk ku di rêbertiya Lenîn de gel rêxistin kir deriyê heyameke nû vekir. Yekîtiya Komarên Sosyalîst ên Sovyetan (YKSS) hat avakirin. Li dijî cîhana îstîsmar û mêtîngehkariyê cepheyeke ku tê de ala azadî û wekheviyê ya karker, kedkar, gundiyên xizan, jin û netewên bindest diheje vebû. Li dijî kapîtalîzmê cepheya sosyalîzmê!

Almanya û dewletên Ewropa yên ku piştî şerê cîhanê hêz komkirin, li dijî YKSSê şerekî pêdeçûnê dan destpêkirin. Elmanyaya Hîtler bi Îtalya û Japonyayê

ve tifaqeke faşîst ava kir, lê li dijî Yekîtiya Sovyetan têkçûneke mezin jiya. Weke Elmanyaya Rojava û Rojhilat bû du parçe. Japonya hat paşxistin. Di şerê cîhanê yê duyemîn de di aliyekî de emperyalîzma Emerîka bû serdestê cîhana kapîtalîst, lê di aliyê din de di gelek welatan de şoreş çêbûn û di pêşengtiya Yekîtiya Sovyetan de kampa sosyalîst pêk hat. Bi vî awayî cîhan weke kapîtalîst û sosyalîst bû du kamp.

Elametên Şerê Cîhanê yê 3emîn

Di sala 1956an de li Yekîtiya Sovyetan revîzyonîzmê desthiladarî bi dest xist û bi vî awayî nakokiyên di hundirê kapma sosyalîst de kûr bûn. Ji ber stratejiya "Bi kapîtalîzmê re jiyîna di nav aştiyê de" kampa sosyalîst ket pêvajoya jihevketinê. Di du aliyan de bandora vê li Rojhilata Navîn bû. A yekemîn dewletên wekî Misir, Filîstîn û Sûrî ji ber polîtîkayên behanegir (pragmatist) ket rewşeke dêrînê. Y a duyemîn partiyên komûnîst ên li Rojhilata Navîn di bin siya revîzyonîzmê de di xeteke reformîst de meşiyan. Ve rewşê heta salên 1990an û 91an berdewam kir. Jihevketina kampa revîzyonîst û bazara kapîtalîst a cîhanî ji nû ve yekpare bûn. Ev bû yekparebûneke reqabeta bi tund û ji hundir ve teqînbar bû.

Kapîtalîzm du hundirê xwe de ket rewşeke cîhaneke pir parçe. Serdestiya Emerîkayê ya li cîhanê paş ket. Sîn bi awayekî lez mezin bû. Îro di cîhanê de hêza ku li dijî Emerîka karibe reqabet bike û jeopolîtîka pêş bixe tenê Sîn e. Rûsya ligel pîşesaziya şer û hêza xwe ya daring, bi hêza xwe ya aborî, siyasî, leşgerî ya li Rojhilata Navîn û Efrîqaya Başûr kampeke din e. Behremandiya Rûsya û Sînê ya ku weke şirîk li dijî Emerîka û hevalbendên wê tevbigere heye. Lê ev jî ne qesî ku tê texmînkirin e.

Emerîka di şerê Ûkrayna û Rûsya de ku li pişta wê NATO hebû nikarîbû xwesteka xwe bi dest bixe. Rûsyayê Ligel tevahî mueyîdeyên malî û siyasî yên li dijî Rûsyayê, paş ve gav navêt. Di esasê de ev şer dikare bê qedandin, lê niha di nav şer de girtina Rûsyayê ji bo Emerîka û NATO rewşeke hîna baş e.

Di heman heyamê de bi dehan bûyerên ku bi taybetî di milê peydakirina xelekên enerjiyê de gelekî girîng ên wekî li Qazaxistan, dagirkeriya Azerbaycanê ya li Ermenîstanê rêya Zengezûra ku ji bo herikana erxazê ya di navbera Tirkiye û Azarbaycanê de xwedî roleke stratejîk in, hatin jiyîn. Di lûtkeya G-20 a ku li Hîndîstanê pêk hatiye de careke din hat dîtin ku rojeva yekdestên emperyalîst ew e ku enerjiya ku ji Asya – Efrîqa û nifta ku li Rojhilata Navîn derdikeve bikişînin Rojava. Pevçûna bingehîn a di navbera Emerîka, Sîn û Rûsyayê de di esasê de li ser kontol û rêbaza vê ye. Rojhilata Navîn di temamkirina enerjiyê de xwedî roleke diyarker e. Ev rastî jî wekî destpêka sedsala 20emîn Rojhilata Navîn dike navenda nakokî û pevçûnan. Gotina serokê Îsraîla Siyonîst a dagirker a Netenyahu ya "Em ê Rojhilata Navîn yekser biguherînin" di heman demê de planêkî çalakiyê ye û li pişta wê hevkariya Emerîka û Îngilistanê heye.

Li Dijî Şerên Emperyalîst Şerê Gelê Şoreşger

Hemleya ku rêxistinên berxwedanê yên Filîstînê di 7ê Cotmehê de li dijî dagirkeriya Îsraîlê da destpêkirin bû navenda tevahî bûyeran. Berxwedana Filistînê bi xistina holê ya bedêleke mezin ket rojeva cîhanê. Rûyê rast ê dewletên Ereb û Misilman ku bi salan Îslamiyet ji bo berjewendiyên xwe yên aborî û siyasî bikaranîn, teva êrîşa jenosîdker a li se Xezayê careke din derket holê. Kesên ku hewl didin ku berxwedana Filîstînê weke şerê Misilman û Yahudî nîşan bidin, bi boneya piştgiriya gelên cîhanê ya ji bo berxwedana Filîstînê vala hat derxistin. Berxwedana gelên Filîstîn û Kurdistanê, rêya azadiyê nîşanî gelên Rojhilata Navîn dide. Têkoşîna azadiyê ya ku gelê Kurd bi salan e, li dijî mêtîngeriyê dide meşandin hêvî dide tevahî gelên herêm û cîhanê. Şoreşa Rojava li dijî stratejiya emperyalîstan a "dabeş bike, parçe bike, bi rê ve bibe" bi têkoşîna yekbûyî ya gel stratejiya şoreşger a gelan ava dike. Ji bo ku gelên Rojhilata Navîn karibin pêşerojeke azad û wekhev biafirînin li dijî şerên emperyalîst honandina têkoşîna yekbûyî ya gelan xwedî girîngiyeke jiyanî ye. Divê kirdeyên şoreşger û gelê Kurd ku xwedî tecrûbeya rêxistinkirî, şoreş û hêza leşgerî ye serkeftina bûyîna kirdeya têkoşîna yekbûyî bi dest bixin. Li dijî şerê emperyalî, rêya azadiya gel bi xwe spartina hêza xwe ya cewherî hilweşandina desthiladariyên mêtînger e. Li Rojhilata Navîn avakirina cepheyeke antî mêtînger û antî emperyalîst erka herî bingehîn a îro ye.

Li Bakur û Rojhilatê Sûrî Çîna Karkeran

Ji bo ku em rewşa karkerên di herêma Rêveberiya Xweser û Demokratîk de fêhm bikin, ji me re hinek agahiyên zanîstî yên ji roja avabûyîna Komara Sûriyê a Ereb heta niha pêwîst in.

Di destpêka sedsala 20emîn de li Şamê karkerên ku di karên çêkirina ta, caw, çerm û febrîqeyên zeytê de xebitîn, bûn bingeha çîna karkerên Sûrî. Ji ber derbasbûna kelûpelên biyanî yên erzan û avabûna kargehên mezin, bingeha sinetkar û têkîlîyên aborî yên kevin hat hilweşandin. Vê jî hişt ku hêza kar a erzan peyda bibe. Di heman demê de beşek ji çîna burjuvaziya biçûk jî bûn karker. Di sala 1938an de sendîkaya karkerên giştî hat damezirandin. Di vê sendîkayê de rola komunîstan gelekî girîng bû. Komunîstan di nav karkeran de hişmendîya sendîkavanî û yekîtîya karkeran pêş xist. Di salên dawî yê 1960-70an de, piştî ku desthiladariya zorbaz a BAAS rêveberiya xwe misoger kir hinek siyasetên wek sererastkirina erdên çandinê û belavkirina wan pêk anî. Avakirina febrîqe û saziyên girêdayî dewletê û pêkanîna mafên civakî yên wek perwerde û tenduristîya bê pere, rewşa karker û cotkaran heta demekê baş kir.

Lê têkoşîna sendîkayên ku komunîstan pêşengtiya wê dikir hat qedexekirin. Piştî derketina desthiladariya Esed a 1970ê de piştgirî da (şerîke û bazirgan)aliyên taybet. Biryarên hişk ên ku hatin girtin hişt ku gelheya (nifûs) yên bêkar bigêhêje %ê 16an. Ev sendîkayên ku hatin avakirin siyaseteke lîberalî meşandin û piştgiriya rejîmê kirin. Bi vê riyê destdirêjiya li ser mafên karkeran kirin. Di sala 2004an de bi zagoneke taybet karmendên dewletê ji bo vê di alîyê sîyasî de bikaranîn. Vê jî hişt ku di nav çînên civakê de û siyasetên netewperest-şoven de hilweşandin derkeve holê. Ji destpêka desthiladariya Esad a sala 1970an şun de gelek biryar di derheqê gelê Kurd de hatin derxistin. Di herêmê de pêşiya hemû pêşketinan hat girtin. Ji bo ku pêşiya pêşketina aborî bê girtin pêşî li ber avakirina şerîke û kargehan hat girtin. Ji bo ku pêşî li ber pêşketina herêmê bê girtin karmend jî ji hundirê Sûrî dihatin anîn. Zorbaziya BAAS di herêmê de ji bo ku wan koçberî hundirê Surîyê bike dest danî ser gelek erdên cotkaran. Ev siyaset yekemîn ji bo nasnameya Kurd tune bike, duyemîn ji bo ku karkerên erzan têxe bin destê burjuvaziya desthiladar de meşand.

Di Herêma Rêveberiya Xweser û Demokrat de Rewşa Karkeran

Dema ku li dijî rejîma BAASî ya şovenîst şoreşê dest pê kir, herêmên Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûrî li dijî tevgerên olperest û yên şovenîst parastina axa xwe kir. Herêmên xwe ji dizî, fawda û valahiya ewlehiya ku rejîmê li herêmê hişt parast. Di herêm û taxan de dest bi avakirina komîn û meclîsan kir. Teva zarokên gel dest bi avakirina hêzeke leşkeri kir. Ji bo rêvebirina herêmê di bin siwana TEV-DEMa ku ji partiyên siyasî yên netewan, yên çepgir û ji kesayetên welatparêz û eşîran pêk hatibû de, kar û xebat hat meşandin. Di heman demê de ji bo parastin û pêşxistina kar yekîtiyên civaka sivîl hatin avakirin. Yek ji wan, Yekîtîya Karkerên Avahiyan a ku piştre bû Yekîtîya Karkerên Qamişlo bû. Vê yekîtiyê ji bo rêxistinkirin û parastina berjewendiyên karkeran piştgiriya şoreşê kir. Di dadgeha gel de jî nûnertiya karkeran dihat kirin. Di heman demê de ji bo destê alîkariyê bidin karkeran bi saziyan re riyên gotûbêjê ava kir. Karker di herêmên Rêveberiya Xweser a demokratîk de dibin sê beş.

Karkerên demsalî û yên çandiniyê: Karkerên çandinîyê li cem xwediyên erdên mezin, rojane kar dikin. Di çandinîyê de; danaheva diramet de bêhtirî %ê 70ê karkeran jin ên emre wan ne zêdeyê 16 salî ne. Bi heqdestê herî kêm dixebitin û tu zagon tine ku di bin germa havînê û sermeya zivistanê de wan biparêze. Di dema nexweşî û qezayên kar de jî tu mafên wan tune ye û bi rêbazên qirêj kedxwariya keda wan tê kirin. Tîm bi tîm dixebitin. Kesê ku li ser tîma wan disekine û jê re dibêjin çawiş, li ser keda wan, bi dehan car zêde fêde dike. Jiyana karkerên demsalî ku dema dirameta çandiniyê bar radikin û datînin weke karkerên çandiniyê ye.

Karkerên Pîşesazî û Şareza: Ev karker di gelek karên cuda de dixebitin. Piraniya wan di emrên ji 16 û jêr de ne. Di bin siwana perwerdekirina kar de bi heqê herî kêm dixebitin. Di Cihê karê wan de xeterî û nexweşî peyda dibin, lê pêwîstîyên parastina jiyana wan tune ye. Ji aliyê xwediyê kar û hoste ve kedxwariya wan tê kirin; bi saetên dirêj dixebitin. Li cihê kar gelek adet û tiştên ne baş di emre xwe yê biçûk de ji yên ji xeynê xwe fêr dibin, lê ev ji bo xwediyê kar ne girîng e.

Karkerên Hoste û Karkerên Rojane: Ev beşa karkeran, di karên avahî, kargeh, sazî, şirîke û cihên bazirganiyê de dixebitin. Hinek ji van karkeran bi heqdestekî rojane, hinek ji van jî bi heqdestên mehane dixebitin. Karkerên avahî zêdetir di xeteriyê de dijîn. Karê wan zêdetir keda bedenî ye û tu mafên wan û ewlehiya kar nîn e. Dema ku kar kêm dibe destheqê wan jî kêm dibe. Ji ber ku ji bo parastina kar û mafê wan tu zagon nîn e. Karkerên di şerîkeyan de, di kargeh û cihên bazirganiyê de li gorî pêwîstiya xwediyê kar bi saetên dirêj dixebitin. Ji ber ku li dijî ji qewitandina kar tu misogeriya wan nîn e, qewitandina ji kar gefa herî mezin e. Car caran bêyî standina heqdestê xebitîna saetên dirêj jî zêdetirî 12 saetan dixebitin. Karkerên saziyan, yên wek karkerên paqijiyê, yên amûrsaziya avê û yên xizmetkar rexmê ku karekî zehmet jî dikin ji aliye civakê ve bi nêrîneke biçûk ku wek karekî qirêj dikin tên dîtin. Lê ev beşa karkeran ji bo civakê karekî pir girîng dikin. Hinek ji beşa karkeran di sûka reş de disekinin û li bendê dimînin ku hinek werin ji wan kar bixwazin. Ev karker mecbûr in ku nivî heqdest qebûl bikin, ji ber ku ji wan re her tim derfeta kar nîn e û ew nîv karker tên hesibandin.

Piştî Damezirandina Rêveberiya xweser Rewşa Karkeran

Gelek sazî û şirîkeyên rêveberiyê hatin avakirin. Hinek derfetên kar ava bûn. Hinek zagonên kar hatin danîn. Karkerên di hundirê saziyan de heqekî baş distînin. Lê li vir jî di aliye tenduristiyê de sîgorte û ewlehiya kar tune ye. Tekîlîyên sazî û şerîkeyên Rêveberiyê bi karkeran re bi riya hevpeymanên demkî tê danîn. Di nav van de şirîkeyên bi piranî parastina berjewendiyên xwe dike û di nav beşên karkeran de jî wekhevî tune ye. Li van cihan jî hinek nêzikatiyên ne rast derdikevin.

Di Bakur û Rojhilatê Sûrî de piştî avakirina Yekîtiya Karkeran hewldan hat dayin ku li ser rewşa karkeran bê sekinîn û karker bigêhêjin mafên kamil. Yekîtîya Karkeran bi taybetî di milê karkerên demsalî de roleke girîng lîst. Derfetên peydakirina kar zêde kir û parastina wan kir. Karker, ji ber timatiya xwediyê kar ku ji bo berjewendiyên xwe heqdestê wan zêde nake û ji ber buhabûna kelûpelan pir zehmetiyan dijîn. Îro hejmara çîna karkeran zêde dibe, feqîrtî di nav civakê de zêde dibe. Ev hişyariyekê dide ku fesada exlaqî di nav civakê de zêde bibe. Ji ber alozîya aborî û tifaqên ku dixwazin li ser herêmê şoreşê têk bibin, peydakirina pêdiviyên jiyanê zehmet dibe. Pêwîst e parastina çîna karkeran ji destdirêjahiyê û kedxwariyê bê kirin. Parastina rewşa wan ya jiyanê û mafên wan bê kirin; ji ber ku karker hîmê şoreşê ya esasî ne.

Şoreşa Rojava ya Jin Ku Rojhilata Navîn Ronî Dike

Bi avabûna civakên çînî re pergala serdest a mêr şerê xwe yê yekemîn li dijî zayenda jinê daye destpêkirin. Bi girtina jinan di nava çar dîwaran de serweriya xwe ya bêsînor hem li hundir hem jî li derve ava kiriye. Jin û keda wê ya ku ji bo avabûna mirovahiyê û civakan xwedî cihekî girîng e, di nava çar dîwaran de hate girtin. Her wiha îstîsmarkirina keda jinê lingên pergala baviksalarî ya serdest a mêr xurt kiriye. Bi pêşketina pergala kapîtalîst, tifaqa wê ya rasterast a bi baviksalarî û îstîsmara keda jinê ya li malê hîna zêdetir kiriye. Jinan di tevahiya dîrokê de heta îro li dijî vê rastiyê her tim li ber xwe dan û ev berxwedan îro bi mezinbûnê berdewam dike.

Dema ku agirê şoreşê li axa Rojava gur bû, jin li Rojhilata Navîn di feraseta herî paşverû ya pergala serdest a mêr a difetisîn. Jinên ku nasname û îradeya wan nedihat dîtin ji ber mecbûriyeta zewaca temenê biçûk, welidandina zarokan, xizmeta mêr, xizmeta mêvanan, paqijî û hemû karên malê yên din di jiyana xwe de tu carî nebûn xwedî gotin. Ew di jiyana hundirê malê de hatin asêkirin. Serdestiya mêr mal kir cîhana jinê, cîhan jî kir mala mêr. Lê bi şoreşa Rojava re jinan hem ji bo xwe, hem jî ji bo zayenda xwe deriyê cîhaneke nû vekirin. Kê xeyal dikir ku jin bibin fermandarên eniyan, tevlî artêşê bibin, bibin rêveber, rêxistinên xwe yên xweser ava bikin û civakê bi rê ve bibin? Lê me jiya û em dijîn, me îradeya rast a jinê dît û em dibînin. Jin bi salan e bi ked û îradeyeke mezin ji bo azadiya xwe têdikoşin. Ji ber ku bêhejmar jinan bi cesaret, qehremanî hişmendiya şoreşgerî û vîna xwe di parastina xaka şoreşê de destan nivîsandin. Jin îro xwedî li mîrateya xwe derdikevin û gav bi gav azadiya xwe tevna dikin. Lê ev ne wekî ku tê gotin an nivîsandin hêsan e. Ji ber ku civaka me hîna jî jin di nava rol û qalibên zayendî de difikire. Feraseta paşverû ya ku ji aliyê pergala serdest a mêr ve hatiye afirandin, rasterast an jî nerasterast hezar dîwar û astengiyan derdixe pêşiya jinê.

Di Hemleya "Keda Hundirê Malê Keda Civakî ye" de Rastiya Mêr

Hemleya "Keda jinê ya hundirê malê keda civakî ye" de ku ji aliyê Jinên Komunîst ên Şoreşger ve tê meşandin vê yekê baş ronî dike. Feraseta serdest a mêr ku keda jinê ya hundirê malê biçûk dixîne, bêqîmet dike û ked, vîn û mejiyê wan biçûk dixîne, qet naqede. Ev di rastiyê de, ronîkirina pergala serdest a mêr a kapîtalîst a di civakî ye. Di dema ev xebata me de gelek jinan rewş wiha vegot: "Rast e mêr li derve dixebitin, lê ji bo karekî û ji bo pere dixebitin. em jin di hundirê malê de hezar karan dikin û kes jî spasiya me nake." Gelek mêr, jinan biçûk dixin û xwe li feraseta paşverû ya civakê digirin û vê yekê tenê erka jinê dibînin.

Jinên Komunîst ên Şoreşger bi vê xebatê di nava jinan de hurmet û hêzeke mezin bi dest xistin. Ji ber ku bi ev rastiya zanîstî, xala herî hestiyar a jinên bindest derdixe holê. Rastiyeke din a ku derketiye bi heman awayî acizbûna mêran bû. Bertekên ku mêr li hemberî vê mijarê nîşan didin rastiya feraseta serdestiya mêr careke din bi tevahî bingeha xwe derdixe pêşberî me. Ew rast dibêjin, ji ber ku ew dizanin ku ev hemû nîqaş rê li ber guherînê vedikin. Mêr nizanin cilan bişon, xwarinê amade bikin, avê germ bikin, zarokan ji dibistanê re amade bikin, mêvanan pêşwazî bikin, lê ya herî girîng ew e ku ew naxwazin fêrî van karan bibin. Ji ber vê yekê, mêrê xwedî feraseta paşverû çi dike? Dixwaze jinên şoreşger bêhêvî bike da ku ew ji bo hevjîn, xwişk û keça wan re nebin mînak. Gotinên wekî "Gelo li ser we ye? Ma hûn ê cîhanê rizgar bikin? We jiyana xwe vala vala xerc kir. Hûn ê bixebitin lê tiştek ji yên me dernakeve." bertekên mêran ên ku yekemîn tên bîra me ne.

Tifaqa me ya Stratejîk: Mêrên Ji Çîna Karker û Kedkaran

Em weke jinên komunîst em bi kurtasî vê rewşê wiha xulase dikin. Em şerekî dualî dimeşînin. Yê yekemîn şerê çînî yê ku pergala kapîtalîst hilweşîne û tevahî karker, kedkar û gelên bindest bi şoreşa civakî azad bike ye. Yê duyemîn û ew qasî girîng jî şerê azadbûna zayendî yê ku rastênhevê şerê çînî pergala serdest a mêr hilweşîne û jinan azad bike ye. Ev her du rastî, şoreşa civakî û şoreşa jinê, du diyardeyên tundraw ên bi hev ve girêdayî ne. Azadbûna yekê bêyî ya din ne pêkan e. Ji ber ku rastiya "Heta jin azad nebe civak azad nabe" bingeha hemû şoreşan e. Hêz û mijara sereke ya şoreşê kedkar, kedkar, ciwan, jinên ji netewe û an mezhebên bindest in. Yek ji hêzên sereke yên tifaqa şoreş jin LGBTI + e. Yek ji hêza tifaqa stratejîk a şoreşa me ya jin jî mêrên bindest ên ji çîna karker û kedkaran e. Yek ji erkên me yên herî girîng ew e ku divê em di aliyekî de bi mêran re şerê çînî bidin meşandin, lê di aliyê din de divê em wan li derdora bernameya şoreşa jin kom bikin û li dijî feraseta wan a serdest a mêr têbikoşin.

Têkîliya mêrên komunîst di têkoşîna azadiya zayendî de wê bi jinên komunîst re çawa be? mijara nivîseke cuda ye, lê dîsa jî pêwîst e li vir behsa çend xalan were kirin. Divê rêhevalên me yên mêr di 25'ê Mijdarê û 8'ê Adarê de ku di têkoşîna azadiya zayendî ya jinan de rojên girîng in, ji bo ku jin hêsantir derkevin kolanan, xwe berpirsiyar bibînin. Mînak, di wê rojê de, mêr dikarin li malê bimînin û erkên wekî lênihêrina zarokan, xwarin û hwd. bi cih bînin ku jin karibin bêxem tevlî vê rojê bibin û bi dilekî aram dakevin kolanan. Mêr bi pratîka xwe dikarin rê li ber wan vekin ku bi hevjînên xwe re beşdarî çalakiyan bibin. Her wiha dikarin xebatên teknîkî yên ji aliyê jinan ve tên dayîn bimeşînin. Bi tevlîbûna çalakiyên girseyî yên jinan ên 8'ê Adarê û 25'ê Mijdarê dikarin di nava seferberiya girseyî de cih bigirin. Li gel van divê mêrên şoreşger-komunîst di têkoşîna li dijî serdestiya mêr de xwedî roleke taybet bin. Divê ji bo azadiya zayendî, têkoşîna xwe ya li dijî serdestiya mêr biparêzin û mêrên derdora xwe ji bo vê yekê qanah bikin. Tenê bi vî rengî zayenda mêr dikare bibe dînamîka şoreşa jinê û bi azadiya jinê şoreşa me misoger bibe. Divê em di tu kêliyan de jî ji bîr nekin ku azadiya jinê wê bi têkoşîna li dijî serdestiya mêr rê li ber azadiya zayenda mêr jî veke.

Cihêtnameya Me Nemirên Me Ne

Ev nivîs nezirî sê fermandarên berxwêdêr ên şoreşa Rojava, sê pêşengên biserûber ên partiyê me, sê stêrkên gelên me, jinan û ciwanan hat kirin.

Vegotina wan ji bo kesên ku hevrêyên rêya wan bûyîna hewldana ronahiyê ye. Ji ber ku naskirina Baran Serhed, Ehmed Şoreş û Yilmaz Behrareş girêk girêk fêrbûna honandina şoreşê ye.

Yekem tiştê ku em ji hevrêyan fêr bibin girêdaniya nemiran e. Di şerê ku weke neferên şoreşê dan destpêkirin de, nemirên me di jiyana wan de bûne can, xwestek û zanebûna wan a pêşxistina mîrasê şoreşê ji bo wan bûye depa qewastinê.

Wayê ji ber vê ye ku Baran Serhed gotinên xwe yên "Girêdaniya nemiran ne gotinî ye, bi çalakî ye" ji xwe re kir şiyar.

Wayê ji ber vê ye ku dema ku Yilmaz Behrareş, hevrê Baran vedigot ji nû ve erk didan xwe an jî dema ku hevrê Ferhad Erebo vedigot soza xwe ya tolhildanê nû dikir. Wayê ji ber vê ye ku dema ku hevrê Ehmed Şoreş Berçem Rênas vedigot asta çalakiyê ji vir dida destpêkirin an jî dema ku Ferhad Erebo vedigot bi gotina "Ger ku wî nikarîbû bibe Che Gîvera, ew ji ber nebûyina min a Fîdel e" girîngiya temamkirina hevrêyê xwe di mêjiya me de nivîsand.

Wan nemirên me weke cihêtnameya rêberbûn û pêşengbûnê pênasekirin û ûsa bi ser dijmin de meşiyan. Hevrêyên me kesên ku bawerî, girêdanî û hezkirina gel fêrî me dikirin bû. Fêrkirin ji bo kesên ku dixwazin bibînin car caran bê gotin dibe. Dema ku hûn bi wan re di nav têkîliyê de bin, hûn hezkirina mirov ku bi kedê hatiye honandin dibînin. Ji ber vê ye ku zarok sûretên wan maçî dikin, kal û pîr ji bo wan digîrin. Herkes ked û hezkirina hevrêyan nas dike. Tevahî nîqaş û rexneyên wan ji ber hezkirinê ye, ji ber hewldana nêzikkirina mirovê nû ye. Partî wekî bîbikên çavê xwe parastin. Siriyeta partiyê noxteya herî hesas a hevrêyan e. Di vê oxirê de şopdarbûyîna çanda serî dayin lê sir nedayinê nîşan dan. Li dijî pratîkên aksê vê têkoşerên lihevneker bûn.

Rewşa şênberbûyîna jiyandin û jiyîna şoreşa yekbûyî ne hevrêyên me. Ji ber vê yekê bi şoreşa Rojava re têkîliyeke şidandî avakirin. Ger ku îro kokên partiyê me gîhaştiye kûrahiya axên Rojava ev destpêkê de ji ber sekna bi çalakî ya hevrê Baran Serhed, Ehmed Şoreş û Yilmaz Behrareş e. Ji destpêka şoreşa Rojava de ji bo ku fermandarî ji şervanan re bikin, pêwîstiyên şoreşê tespît bikin û şoreşê ber bi sosyalîzmê ve pêş bixin gav avêtin. Ev fikra wan, rojaneyî û şêwegirtina wan e. Ev rastiyeke wan a jiyanê bû, pêşengtiya şoreşa Rojhilata Navîn ew qasî navxweyî kiribûn ku ji bo vê ked û hewldaneke gelekî mezin dan.

Hevrê rexnegir û xwerexnegir in. Hinek hevrêyan ji ber rexneyên wî terza hevrê Baran Serhed hişk didîtin. Ji bo kesên ku di çemên biçûk de avjenî dikin rexne zehmet tên. Dema ku mirov di avîya şexsîbûn û ferdperestiyê de asê dibe nikare rexneyan jî qebûl bike. Rexne û rexnedayina kesê xwedî çalakiyên mezin, mezin dibe. Hevrêyên me aksê kesên ku di çemên biçûk de ajvenî dikin bûn kepîtanên deryayên mezin. Bi tevahî giraniya xwe dema ku rexneya heyamên derbasbûyî didan denga wan nelerizî. Ji ber vê karîbûn biryarên jîr dan û bi rihetî li hundirê çavê rastiyê mêzekirin. Ji ber ku hevrêyên me buyîbûn rastiya şoreşgeriyê.

Jiyana bi dîsîplîn û rêxistinkirina her kêliya jiyanê taybetmendiyeke wan a girîng bû. Nehatiye dîtin ku hevrê Baran di xewê de maye, heval Yilmaz di wextê xwe de dest bi erkeke nekiriye, an jî hevrê Ehmed ji bo civînekê dereng maye. Hevrêyan di saetên zû de şiyar dibûn û amadekariya xwe dikirin. Jiyana wan rastiya "Serkeftin berî şer tê bi dest xistin" bû. Tevahî jiyana wan xwedî dsîplîneke karkerê partiyê bû. Tu wextê ku bê windakirin ê kesê hedef mezin nîn e. Tevahî wextê ku bi hevrêyan re derbas dikirin plankirî û rêxistinkirî bû.

Di jiyana hevrêyan de ji xwendina pirtûkan heta fîlmên ku temaşe dikirin, ji pêşketina dorhêl û şexsan heta kûrbûyîna li ser pirsgêrêkên pêşketina şoreş û çaresariyên wê giştî girêdayî hedefên partiyê bû. Amadekariya hevrêyên me ew qasî xurt bû ku mirov nikarîbû wexwandina wan red bike. Parvekirinên ne plankirî û mêkanîk jiyan nekirin, ya herî rast jiyan. Ev parvekirin ji destpêkê heta jêr bi kedê hatibûn sitirandin.

Xwebaweriya pêkanîna tiştê herî rast taybetmendiya herî sereke ya hevrêyan bû. Dema ku li çavê hevalan dihat mêzekirin ev yek hema dihat fêmkirin. Hevrê Yilmaz Behrareş ev rastî di axaftineke xwe de wiha anîbû ser ziman "Em xurt in, rast in û teqez em ê bi ser bikevin" . Baweriya wan a bi serkeftina bindestan, baweriya wan a sosyalîzmê û zanebûna wan a pêşengbûyînê çavkaniya xwebaweriyê ya hevrêyan bû. Tiştê ku pêwîst e em ji wan fêr bibin xwe spartina bindestan, di dilê xwe de hîskirina serhildanan û serdema şoreşan û meşiyana di rêya wan de ye. Bi tirs dayina dijmin û hêz dayina hogiran pêşveçûn taybetmendiya herî eşkere ya fermandarên me bûn. Ji bo vê naskirin ne pêwîst bû, dîtinê têre dikir. Di sekna wan de heybeta serkeftinê hebû.

Kesê ku tenê ji bo mirovbûna te ji te hez dikin û kesên ku ji bo aliyên kevnare biqusînin û bavêjin bi te re herî zêde şer dikin dîsa hevrê ne. Ew bi hezkirineke hevrêyan a bêhempa dagirtîbûn. Dema ku hevrêyên wan zor dijiyan dîsa li ber serî wan ew hebûn. Di têkoşîna me de rê nîşanî me dan. Ev bi fêrkirina rêbazan rêxistinkirin. Hedef danîn pêşiya şervanên partiyê.

Qesî hezkirina hevrêtiyê dîsa em ji rastiya şoreşgeriya wan fêrî hêrsê li dijî dijmin bûn. Niha dem ew dem e ku divê em bi zanebûna hevrêbûna sê fermandarên me yên rêber û pêşeng xwe ji nû ve rêxistin bikin. Çi bextewarî ji yên ku di heman rêyê de dikevin û şer dikin. Niha dem dema ku em di şopa fermandarên xwe yên sor de bimeşin, ala şoreşê bilind bikin û ji dijmin hesap bipirsin e.

Em ê di sala 2024’an de berxwedan û rêxistinbûna xwe mezin bikin

Nûnerên TKŞ'ê Fadya Sîdo û Mîrza Berxo kar û xebatên xwe yên sala borî nirxandin û perspektîfên xwe yên sala nû parve kirin. Nûnerên TKŞ'ê ji bo pirsên me wiha bersiv dan.

Sala 2023’an ji bo komunîstên Rojavayî çawa derbas bû? Hûn dikarin ji me re binirxînin?

Fadya Sîdo: Ez destpêkê tevahî şehîdên sala çûyî bi bîr tînim û sala nû li tevahî şoreşger û gelan pîroz dikim. Me weke komûnîstên Rojavayî di sala 2023an de gelek bedêlên giranbiha spart axê. Ji fermandarê sor Ehmed şoreş, fermandarê ciwan Firat Newal heta komunîstê enternasyonal hevrê Yilmaz Behrareş me di aliyekî de bedêl dan û di aliyekî de jî me li bajaran di bin zor û zehmetiyan de xebatên xwe yên cureyî meşand. Sala 2023an ji bo me sala serkeftin û rakirina tola şehîdan e.

Xebatên me yên cureyî yên wekî bîranîn, belavkirina belavok û rojnameyên me û mijara me ya herî girîng rêxistinkirin bû. Ji bo rêxistinkirina gel sala 2023an ji bo me baş derbas bû. Ji ber ku di rewşa herî zor û zehmet de dema ku gel rastî êrîşên giran dihat em li rex gel bû û di heman demê de di çalakiyên me de gel li rex me bû. Di heman demê de me di meha mijdarê ya şehîdan de ji bo bîranîna şehîdan pêşengehek vekir. Ev pêşengeh li hemû bajaran hat vekirin, bandoreke gelekî mezin a vê xebatê çêbû û roleke gelekî cuda lîst. Ev pêşengeh tenê ne bi danîna sûretên şehîdan hat vekirin, bi tevahî tiştên manewî yên şehîdan nirx û hesta şehîdan zindî kir. Vê hêz û vîna me xurt kir. Ji ber vê yekê em dikarin bêjin sala 2023an ji bo xebatên me di asteke baş de derbas bû.

Mîrza Berxo: Di sala 2023an me bi êrîşa bi êrîşa rêberê komunîst Ehmed Şoreş û Firat Newal pêşwazî kir. Vê êrîşê ji bo me komûnîstên Rojavayî da xuyakirin ku sala 2023an wê bi êrîşên dewleta Tirk faşîst berdewam bike. Lê di heman demê de ev nîşaneya berxwedanê bû. Piştî ev êrîşa li ser fermandarên komunîst xwedî derketina gel a li şehîdan ji bo dewleta faşîst bersivek bû. Ev êrîşa ku li ser fermandarên me hat çêkirin ne tenê bi destê dewleta Tirk, di heman demê de bi destê dewletên emperyalî yên ku li Rojava ne çêbûn. Hebûn û sekna tevgera komunîst a li Rojava ji bo dewleta Tirk û dewletên emperyalî metirsiyeke mezin e.

Me ji bo erdheja ku destpêka salê de li Bakur û bajarên Rojava û Sûrî çêbû xebat meşandin. Di vê heyamê de kar û xebata me li ser vê bûyerê bû. 8ê Adarê li Rojava her tim weke şahiya û çalakiyên mezin dihat girtin dest. Lê di 2023an de ji ber vê erdhejê tenê weke mitîng hat pîrozkirin, me jî bi vî awayî girt dest.

Em Şopdarên Rêya Pêşeng û Rêberên Xwe ne

Me di rojevên meha Adarê yên wekî 12ê Adarê komkujiya Qamişlo, Helepçe û dagirkeriya Efrînê de weke TKŞ hem tevlî çalakiyên giştî bûn, hem jî bi xwe daxuyanî dan. Newroz ji bo me rojeke sereke û girîng e. Xebatên Newrozê ji bo me di navenda xebatên me de bû. Me di 30ê Adarê de ji bo salvegera şehadeta yek ji rêberên Kurd Qazî Mihamed daxuyanî da. Ji bo xwedî derketina dîroka Kurdistanê ev çalakî ji bo me gelekî girîng bû. Wan ji bo Kurdistaneke azad û sosyalîst canê xwe fidakirin û em jî şopdarên rêya wan in. Di 23 Adarê de me careke din weke her tim rêberê û fermandarê komunîst Baran Serhed bi bîr anî. Me di bîranînê de di kesayeta heval Baran de naskirina xeta welatparêzên sosyalîst û fikrê komunîst nîşan da. Em weke TKŞ ji Qazî Mihamet heta Baran Serhed û Ehmed Şoreş şopdarên rêya pêşeng û rêberên xwe ne.

Me bi amadekariya 1ê Gulanê dest bi meha Nîsanê kir. Di vê mehê de amadekariya belavok, lafîte û afîşan destpê kir. Di berfirehiya xebatên 1ê Gulanê de serlêdanên partî û rêxistinan, karker, kedkar, cotkar, karkerên sîna, şaredarî, firnan û hwd. hat kirin. Di asta Rojava de sempozyûmek berfireh hat lidarxistin. Di piraniya bajaran de rengê TKŞê xuya bû û TKŞê pêşengtî ji çalakiyên 1ê Gulanê re kir.

Şehîd Zîlan pêşenga ciwanên komunîst bû. Ji ber vê yekê em 13 Hezîranê weke dîrokeke taybet digirin dest. Em ji jiyana wê fêr dibin. Ji ber ku ew ji bo avakirina bingeha tevgera komunîst bû xwedî kedeke mezin. Roja bîranîna şehîd Zîlan di rêya şehîdlîkê de êrîşeke dijmin çêbû û di vê êrîşê de komunîstê enternasyonal Yilmaz Behrareş şehîd ket. Dewleta Tirk xwest ku bi vê êrîşê tirsekê di nav me de çêbike. Lê bila herkes bizanibe ku em di rêya goristana şehîdan de şehîd dikevin. Em bi vî rihî şoreşa xwe diparêzin û mezin dikin.

Ji bo 19ê Tirmehê ya salvegera şoreşa Rojava gelê me xwedî derketina xwe ya li şoreşê nîşan didin. Em jî pêşengên vê rojê ne. Di destpêka vê şoreşê heta niha komûnîst û sosyalîstan ji bo vê şoreşê xwîn rijandin. Bi taybetî şehîdên Pirsûsê ji bo me xwedî wateyeke pir cuda ne. Weke her sal dîsa li bajaran ji bo şehîdên Pirsusê bîranînên cureyî çêbûn. Bi bîranînên wekî daxuyanî, pêşbirkên fûtbolê, bîranînê sala, çalakiyên rûniştin û hwd. me şehîdên xwe bi bîr anîn.

Piştî vê heyamê jî kar û xebata me bi giranî li ser hevpeymana Lozanê bû. Hevpeymana Lozanê destpêkê ji bo gelê Kurd, Rojhilata Navîn û cîhanê rojeke pir girîng e. Me ev rojev bi xebatên wekî perwerde, civîn, sempozyûm, semîner

û hwd. girt dest. Di heman demê de êrîşên li ser Şengal û çiyayên azad, êrîşên sîlehên kîmyewî û berxwedana bûn rojeva têkoşîna me.

Em weke Tevgera Komunîst mîrasê partiyê komunîst a pêşeng radikin û rêya wê dişopînin. Ji bo tevahî gelên Rojhilata Navîn û cîhanê avabûna pêşengê komunîst tiştekî gelekî pîroz e. Me jî weke komûnîstên Rojavayî di qadên xwe yên xebatê de ev bûyer bi coş û kelecan pîroz kir. Di meha Îlonê de li Dêrazorê çeteyan bi alîkariya dewleta Tirk, rejîma Sûrî û hwd. êrîşa QSD kir. Ji bo vala derxistina ev lîstokên qirêj em bi tevahî hêza xwe li dijî êrîşa Dêrazorê li derdora hêzên şoreşê kom b

Li Dijî Êrîş û Lîstokên Qirêj Berxwedan

Hêzên parastina şoreşa Rojava bi saya ev piştgiriya gelên bindest ev êrîş vala derxistin. Em weke TKŞ tenê ne ji bo Rojava – Bakur û Rojhilatê Sûrî ji bo tevahî gelên Sûrî rêya sosyalîzmê nîşan didin. Di vê salê de li Siwêda hinek tevgera gelan çêbû û hîna berdewam dike. TKŞ ji gelê Siwêda re got ku şoreşa Rojava ji xwe re mînak bigirin. Em weke tevger hêza xwe ji dîroka xwe digirin, ji bo me tecrûbeyên şoreşên cîhanê û şoreşa Oktobir gelekî girîng in. Me di 106emîn salvegera şoreşa Oktobir de li her bajarî civîn, çalakî, semîner û sempozyûm lidar xist. Me destkeftiyên vê şoreşê û di vê şoreşê de destkeftinên jinan kirin mijar. 1ê Mijdarê roja cîhanî ya Kobanê ji bo dîroka berxwedana gelan rojeke gelekî girîng e. Me jî li Kobanê bi vî rengî ev roj pîroz kir û çalakiyên xwe

lidarxistin.

Meha Mijdarê ji bo me meha şehîdan e. Di her bajarî de xebat li ser vê esasê derbas bûn. Ev tenê ne ji bo hevrêyên me, ji bo hemû kesên derdora me jî bi hêstyarî derbas bû. Serlêdana malbatên şehîdan û şehîdlîkan, bîranînên cureyî û pêşengeha şehîdan ji bo xebatên me wateyeke cuda bû. JKŞ hem xebat û hemleyên xwe yên xweser meşand, hem jî tevlî xebatên giştî bû. Ji bo 25ê Mijdarê me weke komunîstên mêr di xeta şoreşa jin de perwerdeyên xwe standin û çalakiyên xwe çêkirin. Em weke komunîstên mêr bi pêşengtiya jinên komunîst li dijî fikra serdestiya mêr destpêkê bi xwe re têdikoşin. Ji ber ku em dizanin ku şoreşa Rojava bi saya xwîna hezaran jinên lêheng hat avakirin. Weke yekemîn şehîda jin a komunîst a li Rojava Sarya Ozgur li hemû bajaran hat bi bîr anîn û taybet li Kobanê girseyî derbas bû.

Em dikarin bêjin ku sala 2023an hem bi êrîşên dagirker, hem jî bi berxwedanê derbas bû. Di aliyê bindestan de berxwedanê bi her şêweyê berdewam kir. Di Filistînê de bi pêşengtiya rêxistinên berxwedanê hemleyeke şoreşgerî çêbû û ev berxwedan pêwîst e ji gelê Rojava re bibe mînak. Piştî vê hemleyê êrîşên dewleta siyonîst a Îsraîlê destpê kir. Berxwedana Filîstînê û komkujiyên dewleta Îsraîl bûn mijarên çalakiyên me û hîna berdewam dikin.

Di vê salê de dewleta Tirk êrîşên xwe rojane li ser Rojava berdewam kir, çalakiya li Enqereyê kir hacet û êrîşên berfireh li ser Rojava da destpêkirin. Tevahî binesaziya Rojava hat bombebarankirin. Lê sekna gel li dijî van êrîşan gelekî girîng bû. Gelê me xwedî li şoreşa xwe derket. Ev êrîş heta niha hîna berdewam in.

Ji bo parastin û pêşxistina şoreşa Rojava çi perspektîfa TKŞê heye, ji bo vê hûn çi dikin?

Mirza Berxo: Şoreş di asteke nû re derbas dibe. Wê an di nav sînor û pirsgirêkên xwe yên pêşketinê de bifetise an jî li hember dorpêçkirinên paşverû ku hem ji derve û hem jî ji hundirîn wê têk biçe. Sîleha herî xurt a pêşwazîkirina vê pêvajoyê bi perspektîfa têkoşîna çînî û sosyalîst e. Em jî bi vê perspektîfê tevahî kar û xebatên xwe didin meşandin.

Fadya Sîdo: Jixwe em ji destpêka vê şoreşê heta niha di nav xebatên parastin û pêşxistina vê şoreşê de cih digirin. Her wiha di tevahî xebatên me de yek ji armancên me yên sereke xilaskirina mêtîngerî û dagirkeriyê ye. Ji bo ku em karibin gava duyem bavêjin ev pêwîst e.

Lê ya din ji bo ku em karibin gava duyem Bavêjin. Pêwîst e ku em ji bo serkeftina şoreşê derbasî hundirê malan bikin. Ger ku em karibin vê şoreşê derbasî hundirê malan bikin wê demê em ê bibînin ku jin rastî tundiyeke çawa tên. Ji ber vê yekê pêwîst e ku em giranî bidin xebata rêxistinbûnê. Wekî ku me anî ser ziman me di vê salê de giranî da karê rêxistinbûnê û di heman demê de ji bo parastinê me di gelek bajaran de tîmên xwe ava kirin. Pêwîstiya vê şoreşê niha amadebûna ji êrîşan re ye. Di naveroka hemû xebatên me de danasîna kapîtalîzmê heye. Kapîtalîzm çi ye? Çima pêwîst e ku em w hilweşînin? Divê em vê bi gel bidin fêmkirin. Rast e şoreşa me niha di merhaleya demokratîk re derbas dibe. Lê weke ku em di pirsgêrêkên pêşketina şoreşê de dibînin êdî pêwîst e ku ev şoreş berê xwe rêyeke cuda yanê merhaleya duyemîn ku karibe ji ev pirsgêrêk û qeyranên ku derdikevin re çaresarî bibîne. Her wiha di naveroka xebatên me de di navbera gelan de xurtkirina wekheviya gelan heye. Ji ber ku hêzên emperyalî ji bo berjewendiyên xwe hewl didin ku nakokiyên navbera gelan xurt bikin. Ev jî di aliyekî de kêmasiya vê şoreşê ye. Ji bo vê yekê pêwîst e ku dewletên emperyalî ji vê xakê bên derxistin.

Hûn ji bo pêşxistina şoreşê bangewaziya sosyalîzmê dikin, hûn dikarin vê nêrinê berfirehtir bikin?

Mîrza Berxo: Şoreşa Rojava şoreşa demokratik e. Gelek destkeftiyên me hene. Gelên bindest di alî neteweyî, ziman, azadiya gotin, çalaki û xwe rêxistinkirin de mafên neteweyî dest xistin. Lê hîna têkoşîna me ya çînî berdewam dike. Di nav şoreşê de çînên burjuvaziya navîn û burjuvaziya biçûk hebûna xwe berdewam dike. Ên dewlemend roj bi roj dewlementir, feqîr roj bi roj feqîrtir dibin. Şoreşa me dikare bi rêya koperatîf, kargehên kolektîf, mafên karkeran û tedbîrên sosyalîst ber bi sosyalizm ve lez bike. Di heman demê de pêwîst e ku em di nav karker, kedkar û cotkaran de zanîstiya çînî xurt bikin. Bangewaziya me ew e ku werin em çîna burjuvaziya navîn ji holê rakin ji bingehê de wekheviyê ava bikin. Bi yekbûyîna karker, kedkar, cotkar û jinan şoreşa proleteryayê ava bikin û şoreşa xwe ber bi sosyalîzmê ve bibin.

Fadya Sîdo: Wekî ku me di bersiva pirsa duyemîn de anî ser ziman, şoreşa me niha di asta demokratîk de ye. Lê hebûna dewletên kapîtalîst û hebûna çînên burjuvaziyê bandor li gelên bindest dike. A yekemîn divê em ji bo gelên bindest şer bikin, ya duyemîn divê em ji bo merhaleya duyemîn gav Bavêjin. Niha em binêrin di nav şoreşa me de hîna gelek tişt tên jiyîn, revandin, tacîz, destdirêjî, kuştin û tundiya li ser jinê berdewam e, ya din di milê aborî de gel hîna gelekî feqîrtî dijî. Ev tê wateya ku bandora kapîtalîzmê hîna gelekî mezin e. Di heman demê de li xaka me ji bo berjewendiyên xwe hîna hebûna dewletên emperyalî li ber pêşketina herêmê bandoreke gelekî mezin dike. Petrola ku bi destê hêzên emperyalî ji xakên me tê derdixin û dibin pirsgêrêkeke mezin e. Ev tevahî qeyranên ku tên jiyîn ji bo şoreşê xeteriyên gelekî mezin derdixe. Ji ber vê yekê em dibêjin rêya yekane sosyalîzm e.

Di derbarê hêzên emperyalîst û hikûmeta Şamê de fikrên TKŞ'ê çi ne?

Mirza Berxo: Di hedefa stratejik a tevgera Komûnîst de demokratîkbûna Sûrî disekine, Tevgera Komûnîst ji ber vê yekê li tevahiya Sûrî avakirina pergala şoreşger, gelparêz û demokratîk a Rojava û Bakurê Sûrî ji xwe re dike armanç. Şoreşa Rojava jî hem ji bo vê hem jî ji bo sosyalîzmê deriyekî girîng e.

Fadya Sîdo: Ji bo pêşeroja şoreşê hebûna hikumeta Şam û dewletên emperyalî xetereyeke gelekî mezin e. Ji ber vê yekê jî pêwîst e ku gelê me li hember siyaseta wê şiyar be. Elbet rejîma BAAS dixwaze xwe li ser xaka me careke din ava bike ku karibe vîna gelên bindest biperçiqîne. Weke stratejîk hebûna dewletên emperyalî û mêtînger bi armanca tunekirina vîna şoreş û nirxên wê ye. Qeyranên piranî yên ku tên jiyîn piranî ji ber vê yekê ne. Berî her tiştî dixwazin ku deriyê koçberiyê ji gel re vekin û karibin axên şoreşê vala bikin, dixwazin demografiya erdnigariya me biguherînin û bi qanûnên qeyser dixwazin me di mil aborî de bifetisînin.

Derbarê tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdulah Ocelan û sîstema Îmraliyê de hûn çi difikirin?

Mîrza Berxo: Tecrît sucê mirovahiyê ye. Abdulah Ocelan rêberê gele Kurd e. Di şexsê Ocelan de dixwazin vîna gelê Kurd bişkînin. Em weke komunîst azadiya Ocelan dixwazin. Ji bo vê çi pêwîst be, çi erk dikeve milê me em jî amade ne. Hem êrîşa li ser Ocelan, hem jî êrîşa li ser girtiyên siyasî polîtîk in. Dewleta Tirk a faşîst di şexsê Ocelan û girtiyên siyasî de dixwaze berxwedana gel bişkîne. Em girêva birçîbûnê ya ku destpê kir silav dikin.

Sala 2023'an ji bo jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê çawa derbas bû?

Fadya Sîdo: Ev ji bo me mijareke gelekî girîng e. Ji ber ku ev şoreş bi hêz û artêşbûyîna jinê mezin bû. Vîna jinê dijmin têk bir. Lê li Rojhilata Navîn taybetî ji ber çanda ol, malbat eşîr û edet û teqelîdan wê jiyana jinan gelekî zehmetir dibe. Ev rewş bandoreke gelekî girîng li ser psîkolojiya wan dike. Bi her awayî tundiya li ser jinê berdewam e. Ji ber vê yekê sala 2023an ji bo jinan bû saleke berxwedanan. Jinên Komunîstên Şoreşger jî di her kêliya jiyanê de li ser vê esasê têkoşîna xwe mezin kirin. Asta xebata jinên komunîst di vê salê de hîna baştir û bilindtir bû. Me Li hemberî tundiya ku rojane zêde dibe kar û xebatên xwe berdewam kir. Ev sal ji bo jinên komunîst bi çalakî û xebatên gelekî girîng derbas bû. Hinek ji van xebatên sereke hemleya 8ê Adarê, destkeftinên şoreşa jinê, 25ê Mijdarê û hemleya "Keda Hundirê Malê Keda Civakî ye", xebatên li dijî tundî, kuştin, revandin, tacîz û destdirêjiyê bûn. Lê dirûşmeya JIN JIYAN AZADÎ di naveroka tevahî xebatan de cih girt.

Xaka Te Pîroz e Biparêze

Berî lidarxistina şoreşa Rojava û serhildanên Rojhilata Navîn ciwan di gelek rewşên zehmet re derbas dibûn. Ji ber vê yekê jî dewletên kapîtalîst her dem ji bo berjewendiyên xwe xwestin ku ciwanan bi aliyê xwe ve bikişînin. Bi taybetî her tim dixwest ku ciwanên xwendekar di zanîngehan de bi cih bike û bi spasnameyên xwe wan navdar bike ku bi bandora vê ciwan berê xwe bidin dewletên Ewropayê.

Piştî ku serhildanên gelê Ereb destpê kir, di vir de hêza ciwanan eşkere bû. Bi pêşengtiya ciwanekî bêkar agirê serhildanê ji Tunusê belavî tevahî welatên Rojhilata bû ji wir gîhaşt heta Rojava Bakur û Rojhilatê Sûrî. Ev agirê serhildanê li Rojava vegeriya şoreşekê û tevahiya ciwanan ji bo bidestxistina azadiya xwe û xwedî lê derketina axên xwe tevlî nav refên şoreşê bûn û di nav YPG û YPJê de xwe bi rêxistinkirin.

Bi hezaran ciwanan ji bo parastina xaka xwe bedêlên giran dan. Lê tu carî êrîşên li ser şoreş û ciwanan neqediya. Dijmin bi gelek rê û rêbazên qirêj xwestin hêza vê şoreşê bidin şkenandin. Ji ber vê yekê her ku şoreş pêş ket, dewletên emperyalî jî li hemberî vê teknolojiya xwe pêş xistin û ev teknolojî ji bo dûrxistina ciwanan ji şoreşê hat bikaranîn û îro hîna jî tê bikaranîn. Hîna heta roja me ya îro ev hewldan berdewam dikin. Bi êrîşên xwe yên li ser vê şoreşê û bikaranîna sîlehên xwe yên pêşketî û bi rêbazên şerê taybet û şerê derûnî dixwaze ku tirsekê di dilê ciwanan de bide avakirin. Divê destpêkê em ciwan baş fêm bikin ku rêbazên şerê qirêj, meşandina şerê taybet bi armanca koçberkirina ciwanan û valakirina xaka şoreşê tên kirin. Bi vê rêyê hewldana guhertina demografiya erdnigariya me tê dayin ku çete û malbatên wan di xakên me de bên bi cih kirin. Ji ber vê deriyê koçberiyê hatiye vekirin. Li ser ev siyaseta qirêj bi hezaran ciwanên me berê xwe dan welatên Ewropayê û dûrî şoreşê ketin. Di destpêkê de armanca dewletên kapîtalîst û faşîst valakirina axên şoreşê û di heman demê de tunekirina destkeftiyên vê şoreşê ye.

ji bo vê jî bi gelek rêbazan xwest ku mêjiya ciwanan belav bike. Bi belavkirina çanda cil û bergên cuda, çanda mûsîka, bi çanda rêzefîlman hewl dide ku di mêjiya ciwanan de çanda kapîtalîzmê xurt bike ku ciwan bi hêz u nirxên şoreşê ve nefikirin. Ji ber vê yekê deriyên xwe heta dawî ji wan re vekir. Taybetî bi bikaranîna amûrê ragihandin û medyaya civakî dixwaze ku Ewropayê li ber çavên ciwan û jinan bike buhareke xweş. Ji bo ku ev yek bandor li ciwanan bike û ew jî di heman demê de bang li ciwanên mayî bikin ku ev şoreş tenê şer, kuştin û mirin e û tu carî aştî çênabe. Di vî milî de hewldana qanahkirinê dide ku li ser vê esasê ciwan ji welatê xwe dûr bikevin. Di heman demê de ciwanên ku ji ber tirsa mirinê koçber bûn an jî ji xakê şoreşê reviyan ji bo ku ji xwe re wekî ku dewletên Ewropî dibêjin jiyaneke hîna xweştir ava bikin di deryayan de fetisîn û mirin. Lê di heman ev rêya koçberiyê de ji bo dewletên emperyalî ku dixwazin hejmara cîhanê kêm bikin bû derfetek. Dema ku ciwan û gelên me koçber dibin bi zanebûn di rêya avê de tên fetisandin û her wiha bi hezaran ciwan, zarok û jinan di ev rêya koçberiyê de tî û birçî jiyana xwe ji dest dan. Dewletên kapîtalîst bi vê yekê dixwazin bigêhêjin armanca xwe, bi mîlyonan koçberan di aliyekî de ji bo berjewendiyên xwe yên aborî û siyasî bikar tînin û di aliyê din de bi van kiryarên xwe rûmeta wan dişkîne, bi mîlyonan koçber rastî tundî, kiryarên qirêj, êrîşên nîjadperest tên û di heman demê de bi hezaran û mîlyonan jin û jinên ciwan û zarokên koçber rastî tundiya cinsî, tacîz û destdirêjiyê tên. Lê gelê me yê ku koçber dibin gelekî pere xerç dikin, war, mal û milkên xwe difiroşin da ku xwe bigêhênin welatên Ewropayê. Ev rewş jî ji bo dijmin rihetiyekê derdixe holê. Ji ber ku jixwe armanca dijmin valakirina van axan in ku ev yek hedefa dijmin hêsantir dike.

Ji ber vê yekê jî em weke Ciwanên Komunîst ên Şoreşger dixwazin ji ciwanan re bidin eşkerekirin ku ev xak bi bedelên giran hatiye avakirin. Ji bo ku em vê ked û nirxê biparêzin pêwîst e em hişyar bibin û lîstok planên dijmin ên qirêj qebûl nekin ku yek ciwan ji ev xaka azadiyê dûr nekeve. Ji ber ku vê şoreşê bi hêza ciwanan destpê kir û pêwîst e ku bi hêza ciwanan bi ser bikeve. Dîroka ciwanan a di nav şoreşê de gelekî girîng e. Ji bo parastina vê dîrokê pêwîst e ku em kedeke hîna mezintir bidin û derfet nedin dijmin ku hebûna xwe li ser tunekirina nasname û pêşeroja me ava bike. Rastiya herî watedar a ku ciwanên me bizanibin “dema ku hûn ji bo azadiyeke şiklî berê xwe didin dewletên Ewropayê bi hezaran ciwanên ji wan welatan jî ji bo azadiya esasî berê xwe dan vê şoreşê ku şoreş û xaka me biparêzin. Ji bo ku bi awayekî azad û rûmet bijîn li ser vê xakê şehîd ketin. Ji ber ku wan nirx û rastiya jiyana azad ne li Ewropa, di şoreşê de dîtin. Ji ber vê pêwîst e ku em li hemberî tevahî zor û zehmetiyê ji bo avakirina pêşerojeke azad xwedî li şoreşa xwe derkevin û ji bo vê kedeke hîna mezintir bidin.

Em weke Ciwanên Komunîst ên Şoreşger bang li hemû ciwanan dikin ku ji xaka xwe dûr nekevin ,derfet nedin dijmin ku kokên xwe li ser axa me berde, nehêlin ku dijmin îradeya we bişkîne, Hûn hêza vê şoreşê ne û li hêza xwe xwedî derkevin. Bi hêza ciwanan teqez em ê serbikevin.

اكتوبر روج افا

